HEVDEM

KURD Û VALÊNTAYIN

Evîn Tahir Hirorî

Evîn hesteka nazik û paqij e ku di derûnê her mirovekî de heye û her çende têgehê viyanê ji mirovekê bo mirovekê dîtir cudaye, lê giring eve ye ku di binyat de çu mirov neşên viyanê nekin belku mirov çi nêr çi mê pêdivî bi kesê duyê heye da ku di gel êk berdewamiyê bidin jiyaneka xweş û viyan ciwantirîn rêk e bo gehiştina vê meremê, lewa fere ku mirov pişkeka mezin ji jiyana xwe bo viyana xwe û xelkê dîtir terxan bike, eger ne be jiyan wê bibe biyabaneka hişik, û peywendiyên xêzanî û civakî dê ber bi lawaziyê çin û di encam de dahênan nahê kirin.

Bi xwe viyan di nav hemû civ-

akan de heye û ne merc e bi tinê di navbera kur û keçan de hebe, belku dinavbera hemû mirovan de heye û bêgoman yê hez ji kesê beranberî xwe bike, wê hez ji hemû mirovan bike.

Di nav civaka me ya kurdî de, ku êk e ji civakên rojhelatî, ji ber zalbûna dab û nerîtên susiyolojî, viyan qedexe ye û ji berku dê şerefê lekedar bike, lewa jî têgehiştina me bo têgehê viyanê têgehiştinek e pekkevtî ye û derzek di nav peywendiyên me de heye û pitiriya xêzanan li ser binyatê evîniyê nahêne danan û bi taybet keçê mafê helbijartina hevjînê xwe nîne û neşêt bi aşkirayî derbirînê ji hesta xwe beranber kurekî bike.

Di rojên salê de, hindek cejnên taybet bi hindek helkevtan hene ku bo wan kesên jêk dilmayî delîveye, ku bi dîtina êk şad bibin. Êk ji van cejnên pîroz, cejna viyanê ye. Her çende pêdiviye rojan e viyan hebe, lê gelek caran lez dihê kirin û asteng dikevine di rêka viyanê de, lewa ji bo vê meremê, roja 14î şubatê hatiye nav kirin bi roja viyanê, anku (valêntayîn) ku bi navê qeşeyekê Romanî ye ku (270) salan berî zayînê romanî ya êmpiratorek hebûye bi navê (Kiladiyos) ku biriyar da bû nabe serbaz jinê bînin ji berku li dû hizrên wî, jinînan şiyanên zelamî kêm dike, lê Valêntayîn dijî vê hizrê rawestiya û jin bo serbazan diînan û aheng bo digêran, lewma împiratorî biryara girtina wî derêxist û li sêdarê da.

Di demê zîndankirina Valêntayîn de, Valêntayîn hez ji keça pasewanê zîndanê dike. Ku keçik ya korebû, lê demê Valêntayîn înay, çavên wê ronbûn û berî wî li sêdarê bidin, nameyek bo evîndara xwe nivîsîbû û li binê nameyê nivîsîbû Valêntayîn û piştî nameya wî ev roj e hate nav kirin bi Valêntayîn.

Herçende ev roj e li welatên rojava û ji layê Mesîhiyan ve çêbûye, lê ne ya girêdaye bi hîç ayînekî ve, belku bi tinê bo hindê ye ku kesên hez ji hevdu dikin hesta xwe bo êk derbibirin. evca çi bi gotineke ciwan yan jî bi pêşkêşikirina guleka ciwan be û dîsan delîveyeke bo wan hevjînên sisitiyek di nav jiyana wan de heyî, da ku pêdaçûnekê di jiyana xwe de bikin û peywendiyên xwe bi hêz bêxin ji berku viyan û dilxweşî du tiştên pêkve girêdayîne û wekî giyanî ne bo leşê mirovî.

Derbirîna vê helkevtê dê peywendiyên civakî xurttir lê bike, herçende hindek Musulmanên hişikbawer dibêjin ku ev helkevteka rojavayî ye û nabe bihête di nav gelên îslamî de û bo nemûne li Pakistan û Hindistan û Îranê hêriş birîne ser çendîn cihên firotina gulan ku gul bi vê helkevtê difirotin, lê supas bo civakên rojava ku rojek taybet bo viyanê çêkir, da ku em hizrê di viyanê de bikin, bi tinê eger hizir jî be û rêzê lê bigirin. Ji ber ku her pêngaveka mirov dihavêje, eger hez û viyan di gel de nebe ya serkevtî nabe.